## Vîdeo 1: Rastiyên sereke derbarê Fînlandiyayê

**Ev vîdeo derbarê kotaya penaberan e ku li Fînlandiyayê ji nû ve bi cih dibin**

**Fînlandiya welatekî çawa ye?**

- Fînlandiya welatekî hinek biçûk e, li bakurê cîhanê bi cih bûye û dikeve navbera Swêd û Rûsyayê.
- Bajarê paytext û yê herî mezin Helsînkî ye, lê piraniya şaredariyên li Fînlandiyayê gelek biçûk in û hema xwedî çend hezar niştecî ne.
- Gelheya Fînlandiyayê derûdora 5.5 mîlyon mirov e.
- Fînlandiya welatekî aram e ku li wir hurmeta mafên mirovan tê girtin.

**Fînlandiya çawa xuya dike?**

- Piraniya Fînlandiyayê bi daristan û deryaçeyan dorgirtî ye, lê bajar û şaredariyên biçûk jî hene li herêmên cuda yên welêt.
- Avahî di şiklên baş de ne û binesazî jî zêde pêşketî ye.
- Li Fînlandiyayê cihên gelek qelebalix hene. Mirov xwedî cihên pir fireh in li hawirdora xwe û jiyan bi giştî gelek aram û rêxistî ye.
- Herêmên bajêrî û çolterî paqij in û baş tên xudankirin. Divê hûn zibilan bi tenê bavêjin nav zibildankan û divê hûn hemû bermayên xwe li gor telîmatan ji hev cuda bikin.

**Li Fînlandiyayê kîjan ziman tên axaftin?**

- Li Fînlandiyayê zimanên fermî Fînî û Swêdî ne.
- Li hin şaredariyan gelheya ku Swêdî diaxivin hijmara piraniyê pêk tînin.
- Piraniya mirovên Fînî bi Ingilîzî diaxivin, lê pêzanîna bi Fînî û Swêdî li dibistanan û jiyana kar pêwîst dike.
- Ji ber koçberiyê, gelheyeke ku hîn mezintir dibe heye ku bi Rûsî, Estonî, Erebî û zimanên din ên biyanî diaxivin.

**Li Fînlandiyayê hewa çawa ye?**

- Çar demsalên sereke hene: zivistan, bihar, havîn û payîz.
- Zivistan sar e û berf dibare, lê li hundirê malan û avahiyên gelemperî, timamê salê hewa germ e.
- Heta dema hewa sar be jî, zarok diçin dibistanê û mezin diçin ser kar.
- Heyama biharê, berf dihele û demsala hêşînbûnê dest pê dike.
- Havîn germ e, her der kesk e.
- Zarokên dibistanê û mirovên ku kar dikin heyama havînê xwedî betlaneyên dirêj in.
- Li payîzê, hewa dest bi sarbûnê dike û piraniya riwekan pelgên xwe vedişînin.

**Li Fînlandiyayê parvebûna rêveberî çi awayî ye?**

- Welat bi herêman dabeş bûye, û her yek herêm jî bi şaredariyan ve dabeş bûye.
- Şaredarî yekeya reveberiyê ye ku ji bo niştecihên xwe xizmetan eyar dike. Ew dibe navçeyek biçûk be an jî bajarekî mezin.
- Her herêma li Fînlandiyayê xwedî dîroka xwe ya zengîn û cuda ye li gel kevneşopiyên xweserê xwe.
- Dema hûn hatin Fînlandiyayê hûn ê yekcar derbasî şaredariyê bin û biçin mala aîdê xwe.

**Bûyerên dîrokî yên herî girîng çi ne?**

- Wek gelek welatan, Fînlandiya jî di paşerojê de hat dagirkirin û têkildarî şeran bû.
- Fînlandiya ji bo 600 salan beşeke Qiraltiya Swêdê bû û piştre jî ji bo 100 salan bû beşeke Împaratoriya Rûsyayê, lê Fînlandiya xwedî dayîna piraniya biryarên xwe bû.
- Fînlandiya di sala 1917an de serbixwe bû. Demeke kurt piştî wê di 1918an de şerê navxweyî çêbû.
- Fînî ji nû ve bûn yekgirtî dema ku wan di Şerê Cîhanê yê II'yem de li dijî Yekîtiya Sovyetê şer kirin.
- Di paşerojê de gelek mirovên li Fînlandiyayê tûşî feqîriyê, birçîbûnê û şertên lavaz ên jiyanê bûn.
- Piştî şerê navxweyî, gelek pêşveçûn derketin holê û Fînlandiya pêde û pêde ber bi civakeke nûjen a dewlemend pêş de çû.
- Fînlandiyayê ji 1945an wir ve bi çi welatî re şer nekiriye.
- Fînlandiya di sala 1995an de beşdarî Yekîtiya Ewropayê bû.

**Li Fînlandiyayê sîstema sîyasî çi ye?**

- Fînlandiya komareke demokratîk e.
- Serokomar serokê dewletê ye li Fînlandiyayê.
- Li Fînlandiyayê kesên hem mê û hem jî nêr wek serokê dewletê tên hilbijartin.
- Parlemento xwedî 200 endam e ku temsîldariya gelek partî û nêrînên siyasî yên cuda dikin.
- Hemû welatiyên Fînî yên 18 salî mezintir xwedî mafê dengdayînê ne.
- Koçber xwedî mafên dengdayînê ne di hilbijartinên herêmî de piştî du salên jiyanê ya li Fînlandiyayê.

**Qanûna Fînî mafê takekesan çawa diparêze?**

- Makezagona Fînî destnîşan dike ku herkesê li Fînlandiyayê dijî xwedî heman mafan e û wekhev e bêyî libergirtina ber çav a welatê wan, temen, zayend, tenduristiya wan û sedemên din.
- Penaberên kotayê endamên tam ên civakê ne û xwedî heman maf û peywîran in wek niştecihên din ên Fînlandiyayê.
- Jin û mêr wekhev tên qebûlkirin li Fînlandiyayê. Herkes xwedî maf e ku bi awayekî azad fikrên xwe îfade bike û li gor dilê xwe cilûbergan li ber bike.
- Çi kes cezayê îdamê nagire û nabe bê êşkencekirin.
- Zarok, jinûmêr an jî kesên din bi çi cureyê tundiyê nabe bên cezakirin; nabe bên lêdan, qutan, porkişandin, an jî nabe bibin mijara şêweyeke tundiyê.
- Destûra tundiya derûnî jî tune.
- Sinetkirina jinan û bikaranîna tundiyê ya bi ser navê namûsê bi awayekî teqez qedexe ye.
- Li Fînlandiyayê, rayedar, polîs jî tê de, gelek pêbawer in û hurmetê dibînin ji ber ku peywîra wan alîkarbûn û parastina gel e. Li gor lêkolînê, 95% ê Fîniyan di vê fikrê de ne ku polîs pêbawer in.
- Çi sedem tune ku mirov ji rayedaran bitirse.
- Fînlandiya yek ji wan welatên cîhanê ye ku herî kêm nelirêtî tê de heye.

**Dînê esasê yê Fînlandiyayê çi ye?**

- Dînê esasî yê li Fînlandiyayê Xirîstiyanî ye û piraniya Fîniyan girêdayî dêra Evancelîk a Lûterî ne.
- Dîn wek mijareke şexsî tê dîtin û di jiyana mirovan de roleke mezin naleyize.
- Gelheya Misilmanan li Fînlandiyayê zêde dibe û li şaredariyên mezin malên nimêjkirinê hene.
- Li Fînlandiyayê azadiya dînî heye, ku wateya wê ew e ku herkes xwedî azadî ye da ku bibe endamê civakeke dînî û pratîkên xwe yên dînî bike, her wisa azadiya bêdînbûnê jî heye.

**Civaka Fînî çawa xuya dike?**

- Ji serxwebûna xwe ta niha, Fînlandiyayê guherînên berbiçav derbas kirin.
- Fînlandiya ji aboriyeke feqîr a çandiniyê ber bi civakeke zanyariyê bi pêş de çû ku teknolojî, zanyarî û xizmet roleke girîng dileyîzin di avakirina zengîniya welêt de.
- Dewlet û şarederî ji bo her hemwelatî û nişteciyên din xizmetên bi têrê yên civakî û tenduristî misoger dikin. Ew xizmet bi bacên ku ji rûniştvanên Fînlandiyayê tên standin tên fînansekirin.
- Hemû niştecî, penaberên kotayê jî tê de, bacê didin da ku sîstema geşdarî ya Fînlandî ku xizmetên perwerdehî, tenduristî, xizmetên binesaziya civakî û gelemperî jî di nav de ne pêk were.
- Ji ber vê, girîng e ku hûn zimanê Fînî an jî Swêdî hîn bin û amade bin ji bo xwendin an jî kar kirinê.
- Jin û mêr li Fînlandiyayê wekhev in û ji her duyan jî tê hêvîkirin ku kar bikin.
- Gelek hijmarên mezin ên jinan hene ku xwedî pozîsyonên bilind in di siyasetê, pozîsyonên karîyerî û qadên din ên civakê de.
- Ji 1990an wir ve Fînlandiya hîn zêdetir bû welatekî pirçandî û gelheya wê ji gelek netew û etnîsîteyên cuda pêk tê. Her çiqas dibe ku hûn rastî neyartiya biyaniyan û nijadperestiyê bên jî wek her derê cîhanê, piraniya Fîniyan dostane ne.

**Malbatên çawa hene li Fînlandiyayê?**

- Yekeya esasî ya malbatê li Fînlandiyayê piranî ji dêûbav û zarokan pêk tê.
- Her çiqas gelê Fînlandî dêûbavên xwe an jî kal û pîrên xwe wek eqrebayên nêzik bihesibînin jî, kêm caran bi wan re dijîn.
- Li Fînlandiyayê, kêmarên cinsî yên wek homoseksuel, lezbîyen û transeksuel xwedî maf in ku têkiliyê çêbikin.
- Tiştekî edetî ye û tê pejirandin ku zarokên 18 salî mezintir ji dêûbavên xwe cuda bin.
- Zarok mecbûr nînin ku bi awayekî aborî alîkariya dêûbavên xwe bikin.

**Ji bo gelê Fînlandî çi tişt girîng e?**

- Gelê Fînlandî hurmetê li şexsîbûnê, duristiyê û demkîbûnê digirin.
- Bi giştî, Fînî tenduristiya baş, malbatê, karkirinê û di demên vala de pêşdebirina şiyanên xwe dipejirînin.
- Gelek Fînî xwezayê û çalakiyên derve dipejirînin ên wek gera li nav daristanê, ajotina bisîkletê, şimitandinê, masîgirtinê û soberîkirina li deryaçe an deryayê.
- Gelê Fînî ji serşûştina di saûnayê de hez dikin. Saûna ciheke kevneşopî û edetî yê serşûştinê ye. Saûna dikare li gelek malên gel bê dîtin û ew pirî caran tên bikaranîn.

- Werzîş di çanda Fînî de roleke girîng dileyize. Fîniyan di gelek werzîşan de naskirinên navnetewî bi dest xistine, bi taybetî di hokeya cemedê de, bi qezenckirina çend şampîyontiyên cîhanê.
- Mirov her wisa dixwazin gelek werzîşê jî bikin da ku li kondîsyon, tenduristî û halxweşiyê miqate bin.
- Ji bo atletek ciwan ê xwedî şiyan û jêhatî, mimkun e ku ew bibe werzîşvanek pispor li Fînlandiyayê.

**Çi tişt Fînlandiyayê dike welatekî bi teknolojiyê pêşketî?**

- Gelek tiştên di civaka Fînî de bi zêdehî dibin dîjîtal û piraniya mirovan amrazên teknolojîk en cuda bi kar tînin wek telefonên jîr, laptop û tabletan.
- Elektronîkên cihê di jiyana rojane de tên bikaranîn û gelek çalakiyên rojane bi telefonên jîr tên kirin, wek mînak dayîna heqê meqbûzan, kirîn û standin û cihveqetandina di xizmetên giştî de.
- Di gelek pîşeyan de, mecbûrî ye ku mirov bikare teknolojiyê bi kar bîne da ku peywîrên di kar de hatine dayîn pêk bînin.
- Ji bo hînbûna wan şiyanan qurs hene û girîng e ku hûn hînî bikaranîna ekîpmanên dîjîtal bin.
- Di gelek malbatan de, zarok amrazên wiha bi kar tînin û teknolojî jî hîn bêtir li dibistanan ji hêla mamosteyan tê bikaranîn.

## Vîdeo 2: Jiyan li Fînlandiyayê

**Ev vîdeo derbarê kotaya penaberan e ku li Fînlandiyayê ji nû ve bi cih dibin**

**Ezê çawa seyahata Fînlandiyayê bikim?**

- Eger hûn wek penaberê kotayê li Fînlandiyayê bên bijartin, destûra mayînê dê ji we re bê dayîn ku ji bo çar salan derbasdar e û dikare bê nûkirin.
- Hûnê destûra xwe ya mayînê û belgeyên seyahatê wergirin beriya ku hûn seyahatê bikin.
- Hikumeta Fînlandiyayê dê seyahata we ya ji bo Fînlandiyayê eyar bike û heqê wê bide.
- Hûnê bi balafirê seyahata Fînlandiyayê bikin û dibe ku hûn di rêwîtiya xwe de balafirê veguhezin.
- Hûnê alîkariyê bistînin di balafirgehan de.
- Hûn ancax dikarin yek çenteyê bi qasî 20 kg bi xwe re bibin balafirê û li gel wê jî zêdetirîn 8 kg çenteyê destan.

**Dema ez gihîştime Fînlandiyayê dê çi biqewime?**

- Eyarkirinên we yên seyahatê dê destpê nekin ta ku şaredariyek li Fînlandiyayê we qebûl neke û mala we ji bo we amade neke.
- Hûnê li navenda penaberan nejîn, li şûna wê hûnê li avahiyeke kirêkirî de bijîn ku mala we bi xwe ye.
- Li Fînlandiyayê hûnê rasterast ji balafirgeha Helsînkîyê ber bi şaredariya xwe ya nû seyahatê bikin çi bi balafirê, çi jî bi otobês an jî erebê.
- Dema hûn gihîştinê, hûnê mifteyên mala xwe wergirin.

- Rayedar û rêxistinên şaredariya we ji dema ku hûn hatin û wir de dê pêşniyaran li we bikin, lê divê hûn bi xwe jî di hînbûna sîstema nû de çalak bin.

**Ez bi xwe re çi bînim Fînlandiyayê?**

- Divê hûn hemû belgeyên nasnameyê yên wek pasaport, kartên nasnameyê, belgeya ajokariyê, sertîfîkayên jidayîkbûnê, pirtûkçeyên malbatê û hwd. bi xwe bigerînin.
- Hemû belgeyên xwe yên girîng ên tenduristiyê yên wek teşxîs, tedawî û belgeyên sereke yên derbarê çîroka we ya tibî bi xwe re bînin.
- Belgeyên girîng ên perwerdehiyê yên wek sertîfîka, derece û dîplomayan jî bi xwe bînin.
- Eger berdest be sertîfîkayên xwe yên karkirinê jî bînin, ku nîşan didin bê ka hûn li ku xebitîne, peywîrên we yên sereke çi bûne, û ji bo çiqas dem hûn li yek cihê xebitîne.
- Eger mimkun be, belgeyan wergerînin bi zimanê Îngilîzî beriya ku hûn bên Fînlandiyayê.
- Dê baş be eger hûn fotografên girîng, tiştên biçûk ên bîranînan û tiştên xwe yên biqîmet bînin Fînlandiyayê.

**Ezê çawa jiyana xwe îdare bikim eger ez bi zimanê Fînî nezanim?**

- Girîng e ku mirov demildest dest bi hînbûna zimanê Fînî bike, hema piştî hevdîtina bijartinê ya bicihkirina penaberiyê.
- Rayedar û rêxistinên şaredariya we ji roja ku hûn hatin û pê de alîkariya we dikin û pêşniyaran didin di rêxistinkirina jiyana we ya rojane, lê divê hûn bi xwe jî gelek çalak bin.
- Helwesteke çalak û erênî ya derbarê bicihbûna li Fînlandiyayê dê gelek ji we re bibe alîkar.
- Rayedarên şaredariyê dê bibînin ku hûn di ofîsa qeydê ya şaredariya ku hûnê lê bijîn de hatine qeydkirin.
- Dema hûn gihîştinê, hûnê bibin xwedî mafê danûstandinê bi alîkariya wergêrekî, lê girîng e ku mirov demildest dest bi xebata hînbûna zimanên Fînî û Swêdî bike, ji ber ku ew ziman li civaka Fînî tên bikaranîn, û xizmetên wergerê gelek bisînor in.
- Divê hûn zarokên xwe wek wergêr bi kar neynin her çiqas ew zûtir bi zimanekî biyanî hîn bin jî.

**Çima dewlet û şaredarî alîkariya min dikin?**

- Ji we tê hêvîkirin ku hûn li ser pîşeyekê bixebitin û destegê bidin xwe û malbata xwe bi rêya karkirinê. Ev yek ji bo mêr û jinan bi awayekî wekhev derbasdar e.
- Fînlandiya dewleteke xwedî refah e û şaredariya we alîkariya we dike ku hûn entegre bin ta ku hûn bikarin îdareya xwe bi xwe bikin.
- Civak jî alîkariya nexweşan, teqawidan û kesên ku bi tena serê xwe nikarin bijîn û pêwîstî bi alîkariya zêdeyî hene dike.
- Sîstema refahê bi dayînên pereyê bacê saz dibe ku ji hemû takekes û şîrketan tê berhevkirin.
- Herkesê li Fînlandiyayê divê heqê bacan bide, her çi xwendekar be, xebatkar be, nexweş an jî bêkar be.
- Bac ji bo nexweşxaneyan, tedawiya tenduristî, xizmetên civakî, perwerdehî û dibistan, xizmetên xudankirina zarokan û hwd. tên bikaranîn.
- Wek niştecîyekî şaredariyê, hûn her wekî yekî Fînî xwedî mafê xizmetên sereke ne, wek perwerdehî, xizmetên tenduristî û civakî.
- Di heman demê de, divê hûn her wekî yekî Fînî qanûn, rê û rêgezên Fînî jî bişopînin.

### Mirov dikarin şaredariya xwe biguherînin?

- Zehmet e ku mirov derbasî şaredariyeke din bibe beriya ku we bi têrê pere berhevkiribe ji bo xercaneyan û hûn bizanin ka bi serê xwe çawa vê yekê bikin.
- Kesên ku li Fînlandiyayê dijîn dikarin bi awayekî azad ji cihekî derbasî cihekî din bin, lê heke hûn wek penaberê kotayê hatibin Fînlandiyayê, tê pêşniyarkirin ku hûn qet nebe salên pêşiyê li şaredariya xwe bimînin.
- Şaredariya we ya xudanker amada ye we pêşwazî bike û cihekî ji bo jiyanê û hemû xizmet û piştgiriyên pêwîst bide we.
- Eger hûn pir bilez lê bar bikin, dibe ku şaredariyeke nû xizmetên entegrasyonê yên ku şexsî û berfireh in nekare ji we re dabîn bike.
- Kêmasiya cihên mayînê yên peredayînê hene û hêsan nîne ku mirov avahîyeke nû peyde bike.
- Eger hûn bar bikin, wisa xuya dike ku hûnê piraniya mesrefê bi xwe bidin.

### Entegrebûn hêsan e?

- Barkirina ji bo welatekî nû dibe ku zehmet û dijwar be bi taybetî jî demên destpêkê. Entegrebûna bi civakeke nû dem û ked dixwaze, lê helwesteke erênî dê ji we re gelek bibe alîkar.
- Girîng e ku di welatê xwe yê nû de hûn mereqdar û heweskar bin.
- Her çiqas reng e ku di jiyana we ya rojane de gelek guherîn ê çêbin jî, ji bo hînbûna tiştên nû vekirî bin û ji bo naskirina gelê Fînî xwedî cesaret bin.
- Şiyanên ziman û torên civakî alîkariyê didin ku hûn entegre bin. Hindî zêde ku hûn zimanên Fînî û Swêdî hîn bin, ewqas ê hêsan be ku hûn gelê Fînî binasin û hevalan çêbikin.
- Dê ji we re gelek bibe alîkar eger hûn qanûnan û pêşniyarên ku we ji rayedaran wergirtî bişopînin.
- Bi bîr bînin ku hûn bi xwe çalak bin, wek mînak bi beşdarbûna bi çalakiyên cihê û bi destpêkirina axaftinan li gel mirovên nû.

### Ezê çawa malekê bi dest bixim ji bo jiyînê?

- Li Fînlandiyayê hûnê li maleke kirêkirî bijîn ku şaredariya we ji we re eyar dike.
- Piraniya maldarkirinên şaredariyê li avahiyên hundirî apartmanekê tên eyarkirin.
- Mal dibe ku bi mezintiyên xwe û şiklê xwe biguherin, lê piranî xwedî odeyên manendî hev ên nav malê ne, ku tê de serşokek, mitbaxek, odeya rûniştinê, odeya razanê û odeyek ji bo zarokan, eger pêwîst be, hene.
- Ew mal xwedî germkirinên navendî ne û tevahiya salê hundirê wan germ e.
- Di hundirê malan de elektrîk û ava lûleyê heye.

### Malên kirêkirî bi mobîlye ne?

- Dema hûn gihîştinê hin ekîpmanên sereke dê hebin, piranî qet nebe nivîn an doşeg, lihêf, hinek mobîlye û hin kewçî û çetel.
- Li avahîyê televîzyon an jî telefon ê tunebe. Piştre hûn dikarin pere berhev bikin da ku tiştên ji bo mala we pêwîst bikirin.
- Gelê Fînlandiyê piranî li ser sobeyên cêranê xwarinê çêdikin.
- Li avahîyan sarinc û carinan jî cemedank jî heye.
- Şaredariya we dê pêşniyaran li we bike bê ka hûn çawa wan bi kar bînin.

**Ez dikarim li hundirê avahiyê cixarê bikişînim?**

- Wek edetî qedexe ye ku mirov li hundirê mala xwe û avahiyên din cixarê bikişîne.
- Her wisa qedexe ye ku mirov li hundirê avahiyên giştî û gerîdeyên veguhastinê cixarê bikişîne.
- Destûra çi cure agirdadanê li hundirê avahiyan tune.

**Ava mûslixê tê vexwarin?**

- Ava mûslixê li Fînlandiyayê gelek paqij e û hûn bêyî kelandin dikarin ava mûslixê vexwin.
- Hûn dikarin hem ava germ û hem jî ya sar ji mûslix û serşokan hilgirin.
- Divê hûn heqê ava ku hûn li malê bi kar tînin bidin, lewma tê pêşniyarkirin ku hûn pir zêde avê bi kar neynin.

**Çawa ezê li nav şaredariyê tevbigerim?**

- Di gelek şaredariyan de veguhastina giştî ya lokal a kêrhatî û ewle heye.
- Di şaredariyên biçûk de xizmetên sereke piranî nêzikî malên kirêkirî ne, lewre hûn dikarin peyatî xwe bigihînin hemû cûreyên xizmetan.
- Bisîklêt ajotin jî rêyeke ewle û erzan e ku mirov here derûdorê eger mesafe kurt be.
- Meş bi tenduristî ye û mirov gelek caran mesafeyên dirêj ên wek 2-5 km dimeşin ji bo çûna ser kar an jî dibistanê.
- Otobês û tren ji bo hatinûçûnên bi mesafeyên dirêj xizmeta veguhastina giştî dabîn dikin. Di ser de jî, balafirên hundirî hene, lê piranî ji veguhastina giştî bihatir in.
- Xizmetên veguhastina giştî yên netewî, herêmî û lokal wisa hatine sêwirandin ku hindî ji dest hat xizmetên pêbawer, ewle û berfireh dabîn bikin ji bo rêwiyan. Bikaranîna veguhastina giştî ji kirîn û bikaranîna erebeyeke şexsî erzantir e.
- Taksî li Fînlandiyayê gelek biha ye, lewre dema ku acil be wê bi kar bînin.

**Veguhastina giştî ewle ye ji bo malbata min?**

- Veguhastina giştî ji bo herkesî gelek ewle ye.
- Jin bi tena serê xwe dikarin veguhastina giştî bi kar bînin.
- Zarok dikarin veguhastina giştî bi tena serê xwe bi kar bînin ji bo çûna dibistanê û li demên xwe yên vala.
- Eger kesek rêka xwe an jî rawestgehê nekare bîne bîra xwe, ajokar an jî rêwîyên din dikarin bibin alîkar.
- Sepanên online hene ku rênîşanên gelek aşkera, nexşerêyan û demên hatinçûnê dabîn dikin.

**Ezê çawa xwarina xwe bikirim?**

- Mirovên li Fînlandiyayê xwarina xwe û sebzeyên xwe piranî ji dikan û firoşgehên mezin dikirin.
- Li wan rojan li Fînlandiyayê hejmara dikanên ku xwarinên etnîk yên cuda difiroşin ên ku ji welatên Ereb, Asya û Afrîkayê tên zêde dibin.
- Di wextê havînê de, market sebzeyên taze û hilberînên din ên wek kîwark û tûyên dêm ên ji daristanê difiroşin. Market her wisa cihên hevdîtinê ne ji bo mirovan.
- Hûn dikarin kîwark û tûyên dêm ji daristanê berhev bikin.

**Ezê çawa bi têrê pere bi dest bixim ji bo kirîna tiştên ji bo mala min pêwîst?**

- Li destpêkê hûnê ji bo lêçûnên sereke yên jiyanê destega aborî bi rêya sîstema civakî wergirin. Mîqdara destega hûn hilgirin li gor qanûnê ye.
- Destega hûn hilgirin bi tenê têra lêçûnên sereke dike û mehê carekê tê dayîn.
- Nayê pêşniyarkirin ku hûn deyn pere bistînin ji bo dayîna lêçûnên xwe.
- Bihaya tiştan li Fînlandiyayê gelek bilind e. Girîng e ku mirov li nav malbatê pîlana xerckirinên xwe bike.
- Ew tişteke edetî ye ku mirov cilûbergan, bisîklêtan, û tiştên zarokan li dikanên destê-duyem bikire ku li wir bihaya tiştan gelek erzan e.
- Kalîteya li dikanên destê-duyem dikare gelek bilind be û cûreyê hilberînan jî gelek zêde be.
- Li wan rojan kirîn û firotina cilûberg û pêlavan li ser înternetê gelek tê dîtin.

**Fînlandiya kîjan diravê bi kar tîne?**

- Diravê li Fînlandiyayê euro ye. Ew diravek e ku ji aliyê piraniya welatên ku girêdayî Yekîtiya Ewropayê ne tê parvekirin.
- Fînlandiyayê di sala 2002 de dest bi bikaranîna euroyê kir.

**Ez dikarim pere bi kar bînim dema kirînûstandinê de?**

- Dayîn dikare bi pere an jî karta bankê pêk were. Dîsa jî, wek şêweya dayînê kart êdî bêtir tên bikaranîn.
- Ji bo karta bankê pêwîst e hesabê we yê bankê hebe.
- Ji bo her yek mezinê koçber pêwîst e ku ew hesabê xwe bi xwe veke.
- Mêr û jin xwedî hesabên xwe bi xwe, yên cuda ne.

## Vîdeo 3: Li Fînlandiyayê xudankirina zarokan, perwerdehî û mafên sereke ji bo zarokan

**Ev vîdeo derbarê kotaya penaberan e ku li Fînlandiyayê ji nû ve bi cih dibin**

**Fînlandiya welatekî baş e ji bo ku zarok tê de mezin bibin?**

- Fînlandiya xizmetên giştî ji bo hemû niştecîyan dabîn dike.
- Jinên avis û zarokên di hemû temenan de di klînîkên tenduristî de xizmetên taybet werdigirin.
- Li Fînlandiyayê, qanûn nahêle ku zarok karê giran bikin û ji dibistanê dûr bimînin.
- Mafên sereke ji bo zarokan mafê xwe gihandina xizmetên tenduristiyê, perwerdehiyê, jiyana malbatî, leyîz, pîvanên guncav ên hêjayî jiyanê û parastina ji îstismar û zererê digire nav xwe.

**Dibe ku li Fînlandiyayê dêûbavtî ji ya ku em hîn bûne cudatir be?**

- Hemû dêûbavên li cîhanê tişta herî baş dixwazin ji bo zarokên xwe. Di pratîkê de, hin edetên dêûbavtiyê dibe pêwîst bike bên guhertin dema hûn li Fînlandiyayê bi cih bûn.
- Daxwazên zarokan divê bên guhdarîkirin û divê ew li hawirdoreke ewle bijîn û xwedî têkiliyên erênî, nêzik bin.
- Keçik û kurik divê bi awayekî wekhev muameleyê bibînin, û timamî jiyana xwe ew xwedî heman mafan bin.
- Hûn mecbûr in ku li sihhet û pêşveçûna zarokên xwe binêrin ta ku ew bûn mirovên mezin.
- Di qanûna Fînî de, zarok dema bûn 18 salî wek mezin tên hesabkirin.

- Eger hûn di xudankirinê an jî têkiliyên malbatê de zehmetiyan bijîn, hûn dikarin alîkariyê ji kreş, dibistan an jî ji xizmetên piştgiriya malbatan a şaredariyê bixwazin.

**Ez dikarim cezakirina fîzîkî wek şêweyeke disîplînê pêk bînim?**

- Li Fînlandiyayê, lêdana fîzîkî derqanûnî ye.
- Hûn nikarin zarokan bi lêdanê an jî kişandina porê wan bi awayekî fîzîkî ceza bikin. Hemû tundiyên li dij zarokan sûc in.
- Rêyên alternatîf hene ji bo xudankirin û dîsîplînkirina zarokan ku kêrhatîbûna wan hatiye testkirin.
- Ew rêyên alternatîf dikare bi xebatkarên civakî û tenduristî, bi kreşên zarokan û dibistanan bên nîqaşkirin.

**Kî zarokan xudan dike dema dêûbav dixwînin an jî dixebitin?**

- Hemû şaredarî ji bo zarokên jêr heft salî perwerdehiya destpêkê li kreşê û ji bo zarokên şeş salî li pêşdibistanê organîze dike.
- Her du dêûbav jî dikarin bixebitin an jî bixwînin dema ku zarokên wan li kreşê be.
- Li kreşê zarok dileyzin û hînî şiyanên cuda dibin ku ji bo wan kêrhatî dibin dema ew dest bi dibistana seretayî dikin. Mamosteyên li kreşê pisporên ku baş perwerde dîtî ne.
- Zarokên koçberan zûka hînî Fînî û Swêdî dibin dema ku ew li kreşê li gel zarokên din dikevin nav têkiliyê.
- Ji zarokên li kreşê re hemû xwarinên pêwîst ta dayîn.
- Zarok hêj ku yek salî ne dikarin dest bi kreşê bikin eger ku dêûbavên wan dixebitin an jî dixwînin.
- Ji bo we tiştekî baş e ku zarokê we herî kêm di sê saliyê de dest bi kreşê bike da ku bi zimanê Fînî an jî Swêdî hîn bibe.

**Perwerdehiya di temenê biçûk de bêpere ye?**

- Li gor dahatiyên we yên malbatî û hejmara zarokan hin heqên pereyî hene.
- Piranî mirov heqê ji bo perwerdehiya di temenê biçûk de didin eger ku li ser karekê bin û maeşê bi têra xwe bilind bistînin.
- Ew ên ku dahatiyên wan kêm ji dayîna heq azad in, lê dîsa jî zarokên wan heman xizmetan werdigirin.

**Li Fînlandiyayê kengê zarokek diçe dibistanê?**

- Zarok piranî di temenê heft salî de dest bi asta yekem a perwerdehiya sereke dikin.
- Hemû zarokên li Fînlandiyayê divê berdewamî perwerdehiya sereke bibin.
- Perwerdehiya sereke piranî neh salan didomîne navbera salên 7-16.
- Zarokên ku nikarin Fînî û Swêdî biaxivin destega zêdehî werdigirin di hînbûna ziman de.

**Rojeke edetî ya li dibistana seretayî çawa derbas dibe?**

- Roja dibistanê dibe ku li rojên cuda di saetên cuda de dest pê bike. Wek edetî, roja dibistanê ji Duşemê ta Înê di saet heşt an jî nehê sibê de dest pê dike.
- Li heyama roja dibistanê dersên derbarê mijarên cuda hene wek ziman, matematîk, bîyolojî, dîrok û werzîş.

- Zarok dema navberan li derve dileyîzin.
- Hemû zarok li dibistanê xwarina germ dixwin.
- Mamoste dibe ku rojane spartekên malê bidin.
- Roja dibistanê piranî di navbera 12-14ê piştî nîvro bi dawî dibe.

**Derbarê xwendina zarokan de berpirsiyariyên dêûbavan çi ne?**

- Wek dêûbav divê hûn çavdêriyê bikin ku zarokên we rojane beşdarî hemû dersên dibistanê bin.
- Divê hûn demildest dibistanê agahdar bikin eger zarokên we ji ber nexweşiyê an jî sedemên din neçin dibistanê.
- Divê hûn çavdêriyê bikin ku zarokên we spartekên malê yên mamosteyan dayî timam bikin.
- Dibistan û dêûbav li Fînlandiyayê derbarê pêşveçûna şagirtan bi berdewamî danûstandinê dikin.

**Zarok li demên xwe yên vala dikarin çi bikin?**

- Girîng e ku zarok beşdarî çalakiyên demên vala bin ku tê de dê ziman hîn bin û hevalên Fînî nas bikin.
- Li Fînlandiyayê vebijarkên cuda yên demên vala hene ji bo zarokan.
- Şansên wan hene ku beşdarî werzîşê, reqasê, muzîkê, hunerên dîtbarî an jî şanoyê, qursên aşpêjiyê bin ku ew hema ji wan çendek in.
- Gelek dibistan, navendên ciwanan, rêxistin û pirtûkxaneyên giştî çalakî û kulûbên cuda yên demên vala ji bo zarokan organîze dikin.

**Ew çalakî bêpere ne?**

- Hin ji wan çalakiyan, wek kulûbên werzîşê, bi peretî ne, lê gelek cureyên çalakiyan hene ku bi timamî bêpere ne.
- Malbat dikarin bi hev re gelek çalakiyên dema vala derbas bikin bêyî lêçûnên wek serlêdana qadên leyîzê, pirtûkxaneyên giştî, û çalakiyên çandî û werzîşê.
- Girîng e ku malbat bi hev re dema xwe derbas bikin û zarokên xwe bibin derve ji bo leyîstinê.

## Vîdeo 4: Firsetên perwerdehiyê û jiyaneke watedar ji bo ciwanan

**Ev vîdeo derbarê kotaya penaberan e ku li Fînlandiyayê ji nû ve bi cih dibin**

**Li Fînlandiyayê sîstema perwedehiyê çawa ye?**

- Sîstema perwerdehiyê ya Fînî bi kalîteya xwe ya bilind û pîvanên xwe navdar e. Ew firsetên perwerdehiyê ji bo herkesî pêşkêş dike, ne girîng e ku mirov çend salî be.
- Perwerdehiya sereke ya Fînî ji dibistana seretayî (astên 1–6) û dibistana navîn (astên 7–9), perwerdehiya navîn a jor û perwerdehiya bilind pêk tê. Perwerdehî bê pere ye.
- Dibistana sereke ji bo kesên jêr 18 salî derbasdar e.
- Şaredariya we dê li dibistaneke lokal ji bo we ciheke xwendinê eyar bike û hûnê di hînbûna zimanê Fînî û Swêdî de alîkariyê bistînin.
- Mamosteyên we dê biryarê bidin ka kîjan ast ji bo we guncav e, bi rêya nirxandina xwendinên we yên berê û temenê we.

- Eger hûn di temenê 17 an jî jortir de bên Fînlandiyayê, hûn dikarin timamê mufredata perwerdehiyê di dibistaneke navîn a jor a ji bo mezinan de bibînin.
- Li Fînlandiyayê xwendin wisa hatiye çêkirin ku bi kêrî xwendekarên cuda bê da ku her yek xwendekar bikare xwendina xwe bi xwe xilas bike û bikeve nav xwendinên bilind an jî bikeve nav kar.

**Ezê bikarim xwendinê bi Fînî an jî Swêdî pêk bînim?**

- Piştî salek li pola amadekariyê an jî piştgiriya ji bo bidestxistina şiyanên pêwîst ên zimanî, hûnê alîkariyê bi zimanê Fînî an jî Swêdî di xwendinê de wergirin.
- Îngilîzî di dibistanan de wek zimanê duyem tê hînkirin û gelek zimanên din jî hene ku hûn dikarin li ser bixebitin, lê bijartin girêdayî dibistanê ye.

**Ez dikarim dest bi kar bikim piştî dibistana navîn?**

- Ne tiştekî edetî ye ne jî hêsan e ku demildest piştî dibistana navîn mirov bikeve nav jiyana kar.
- Bi tenê çend cure kar hene ji bo mirovên bê perwerdehî. Lewma, tê pêşniyarkirin ku mirov li Fînlandiyayê xwendinê bidomîne.
- Piştî dibistana sereke, hûn dikarin bikevin dibistana navîn a jor ji bo xebatên akademîk ên wêdetir, an jî hûn dikarin li dibistaneke pîşeyî bixwînin ji bo pîşeyekê. Her du xwendin jî dê bi qasî sê salan bikişînin.
- Piştî timamkirina xwendinên pîşeyî, hûn dikarin dest bi lêgerîna karekê an jî cihekî ji bo pratîka kar bikin.
- Hêj dema xwendinê jî, çend pardemên pratîka kar hene, ku di wan deman de hûn tecribeyên girîng ê kar bi dest dixin.
- Gelek cureyên firsetan hene ji bo we da ku hûn di demên xwe yên vala de û li betlaneyan bi karên nîvdan mijûl bin da ku pereyê xercaneyê ji xwe re qezenc bikin.
- Ji temenê 15 û wir de hûn dikarin bi serê xwe peymana kar îmze bikin. Beriya wê demê peymana kar divê ji hêla dêûbav bê îmzekirin.

**Di demên xwe yên vala de ez dikarim çi bikim?**

- Şaredarî û rêxistinên cuda gelek cureyên firsetan ji bo demên vala ji bo ciwanan dabîn dikin û piraniya wan bê pere ne.
- Hûn dikarin bi xwe ji nav cureyên cihê yên werzîşê, reqasê, hunerê, çalakiyên xwezayî û karên dilsozî çalakiyên ku jê hez dikin bibijêrin.
- Cihên vekirî û qadên derve yên werzîşê hene ku ji hêla herkesî ve dikarin bên bikaranîn.
- Gelek pirtûkxaneyên giştî xwedî beşên taybet in ji bo ku ciwan serî lê bidin û leyîzan bilîzin û bi ciwanên din re bên cem hev piştî dibistanê an jî êvaran.
- Hûn dikarin ji pirtûkxaneya xwe ya lokal pirtûkên bi zimanên cuda hilgirin bêyî çi mesrefî.

**Li Fînlandiyayê têkildariyên evîndariyê û zewac çawa çêdibin?**

- Ciwan û mezin bi hevdîtinê hev û din nas dikin. Ev firsetekê dide dostan ku hev û din baş nas bikin.
- Hevdîtin pêwîst nake ku bibe têkildariyeke zewacî.
- Li Fînlandiyayê, tiştekî edetî ye ku mirov beriya zewacê têkildariyeke evîndariyê bijî.
- Temenê kêmtirîn ê zewacê li welêt ji bo her du cinsan 18 sal e.

- Hem jin û hem jî mêr xwedî maf in ku biryarê bidin bê ka kê dixwazin ji bo hevdîtinê an jî zewacê; ew bi xwe biryarê didin bê ka kê dê bibe hevserê wan ê pêşerojê.
- Nabe ku zor bi çi kesî bê kirin ji bo hevdîtin an jî zewacê.
- Zordariya li ser kesekî ya ji bo zewacê bi qanûnê tê cezakirin, çi mêr be çi jî jin.
- Li Fînlandiyayê hûn di yek demê de ancax dikarin bibin xwediyê yek hevserê.
- Li Fînlandiyayê, her kes dikare hevsera/ê xwe berde û hewce nîne ku ji hêla aborî ve girêdayî hevsera/ê xwe yê berê be.

**Beriya zewacê destûr heye ku mirov bikeve nav têkildariyên cinsî?**

- Hem jin û hem jî mêr bi awayekî serbest ji xwe re hevalan çêdikin û sosyalîze dibin heta li gel cinsê dijber jî. Dîsa jî, di hemû rewşan de, hevdîtin nayê wê maneyê ku ciwan dikevin nav têkildariyên cinsî.
- Her wisa tiştekî qanûnî ye û tê pejirandin ku cotên ciwan bi hev re bijîn û bikevin nav têkildariyeke cinsî û heta vê yekê bê zewac jî bikin.
- Temenê pejirandinê ya bi kiryareke cinsî li Fînlandiyayê 16 sal e.
- Ev temenê kêmtirîn e ku takekesek bi awayekî fermî bi têrê mezin bê hesibandin da ku beşdarî kirineke cinsî bibe.
- Herkesê li Fînlandiyayê xwedî mafê qanûnî ye ku kesekî din ji bo temaseke fîzîkî red bike. Tu kes, hevserê zewicî jî tê de, nikare bêyî pejirandin ji bo têkildariya cinsî bê zorlêkirin.

**Ez dikarim bi yekî Fînî re malbatekê çêbikim?**

- Hûn azad in da ku bi her kesê ku hûn pê re ne û we ji bo têkildariyê li hev kiriye malbatekê çêbikin.
- Gelek hijmarên zêde yên cotên têkilhev û malbat çêdibin li Fînlandiyayê ku ji du neteweyên cuda pêk tên.
- Fînî hevserên xwe bi xwe dibijêrin û ji dêûbav û malbatan destûra pêş pêwîst nake.
- Beriya avakirina malbatekê, girîng e ku hûn bi hev re nîqaşa qîmetan, hêviyên pêşerojê, xwestina ji bo zarokan û mijarên din ên girîng bikin ku bandora wan li ser jiyan cotan dibe çêbe.
- Hevser dikarin fikra malbatên xwe bipirsin, lê malbat an jî dêûbav divê hurmetê nîşanî bijartina wan a hevserê xwe bide.

**Dibe ku ez ji ber neteweya xwe ya cuda û şiklê xwe bêm êşandin an jî tawanbarkirin?**

- Hemû êşandin û tawanbarkirin li Fînlandiyayê qedexe ne û herkes li pêş qanûna Fînî wekhev e.
- Li dibistanan û di xizmetên giştî de êşandin û tawanbarkirin bi tundî qedexe ye.
- Eger hûn bi xwe vekirî bin ji bo naskirina mirovên nû û hewl bidin Fînî û Swêdî bi kar bînin, kifş e ku hûnê baş bi Fîniyan re derbas bikin.
- Dibistan, hobî û çalakiyên ciwanan firsetên hêja ne ji bo çêkirina hevalên nû.

## Vîdeo 5: Perwerdehî û jiyana kar ji bo mezinan

## Ev vîdeo derbarê kotaya penaberan e ku li Fînlandiyayê ji nû ve bi cih dibin

### Gavên destpêkê çi ne dema ez gihîştim Fînlandiyayê?

- Eger hûn mezinek bitenduristî bin di temenên 17–64 de, divê hûn xwe qeyd bikin xizmetên kardarkirina giştî wek bêkarek ku li kar digere.
- Rayedar û pêşniyarker di wan pêvajoyan de dê ji we re bibin alîkar.
- Şiyanên we yên zimanî û tecribeyên we yên berê yên kar ê bê nirxandin, û hûnê pîlaneke entegrasyonê ya şexsî wergirin.
- Ofîsa kardarkirinê dê qeyda we çêbike ji bo qurseke entegrasyonê ku şiyanên ziman, zanyariyên derbarê civaka Fînî û jiyana kar dabîn dike. Hûnê beşdarî pratîka karkirinê jî bin.

### Eger ez nekarim kar bikim dê çi bibe?

- Eger hûn wek kesekî ku nikare beşdarî jiyana kar be bên hesibandin, wek kesên nexweşê dîyabetê, kesên ji 64 salî jortir, dayikên ku li malê zarokê xwe yê sava xudan dikin û hwd. pêwîst nake hûn qeyda xwe li ofîsa kardariyê çêbikin.
- Eger hûn aîdî vê komê bin, hûn pîlana xwe ya entegrasyonê ya şexsî li gel ofîsa civakî ya şaredariya xwe amade dikin.
- Pîlana entegrasyonê dê ji we re bibe alîkar ku hûn qurseke guncav a ziman û çalakiyên din ên watedar ên wek komên cuda ji bo çalakbûnê peyde bikin.
- Her çiqas pêkan xuya neke ku hûn bikevin nav jiyana kar, pir girîng e ku mirov zimanekî nû hîn be û civaka Fînî nas bike.
- Her wisa ji we tê hêvîkirin ku hûn li tenduristiya xwe û siheta xwe miqat bin.

### Dê çi bibe eger ez xwendin û nivîsandinê nizanibim?

- Çend qursên taybet hene ji bo kesên nexwende.  Pêwîst nake ku hûn xwendin û nivîsandinê bizanin beriya ku hûn bên Fînlandiyayê an jî dibe ku hûn bikarin bi tenê zimanê xwe bixwînin an jî binivîsin.
- Qursên ji bo mirovên nexwende bi lezeke giran dimeşin da ku hemû beşdar di dawiyê de hînî şiyanên esasî yên xwendinê bin.
- Piştre hûn dikarin beşdarî qursên entegrasyonê yên pêşdetir bin.

### Koçberên mezin ên ku dibistana xwe ya sereke xilas nekirine berdewamî dibistanê dikin?

- Eger we li welatê xwe dibistana sereke timam nekiribe û hûn hîn jî ciwan bin, dibe ku qeyda we ji bo dibistana navîn a jor a ji bo mezinan bê çêkirin.
- Xizmetên kardariyê yên giştî dê bêtir rênîşanan dabîn bike û alîkariya we bike da ku hûn qeyda xwe ji bo qursên herî guncav ji bo xwe çêbikin.

### Ez dikarim demildest dest bi kar bikim dema ez gihîştim Fînlandiyayê?

- Wek penaberê kotayê hûn xwedî destûra mayînê û xwedî mafê karkirinê ne dema hûn gihîştin Fînlandiyayê. Mafê we yê karkirinê di karta we ya destûra mayînê de tê destnîşankirin.
- Dibe ku hûn xwe bi karkirina demborî mijûl bikin li gel entegrasyon û xwendinên xwe yên din.
- Dîsa jî, li Fînlandiyayê, dijwar e ku mirov karekê peyde bike bêyî şehadetnameyekê ku ji xwendinan an jî ji şiyanên din ên pêwîst bi dest ketiye.

- Pir girîng e ku mirov şiyanên esasî bi zimanên Fînî an jî Swêdî hîn bibe. Girîng e ku mirov gotinên sereke hîn beriya gihîştina Fînlandiyayê hîn be.
- Hûn dikarin bi rêya xizmetên kardarkirinên giştî an jî taybet an jî bi rêya rasterast danûstandina bi kardaran kar peyde bikin.
- Hem karên nîv-demî û hem jî yên tam-demî hene. Saetên tam-demî yên edetî rojê heşt saet in.

**Di bazara kar a Fînî de çi cure kar peyde dibin?**

- Refaha cîvakî, karên tenduristiyê, perwerdehiya destpêkê ya zarokatiyê û paqijkarê ew qad in ku herî zêde pêwîstiya kar pê hene li deverên cuda yên Fînlandiyayê.
- Her wisa firsetên baş ên kardariyê hene di qadên avakirinê, endustiriya mekanîk, xwarinçêkirin, daristankarî û veguhastinê de.
- Zanîna bi şiyanên zimanên Fînî û Swêdî esasî ne hem ji bo xwendina ser kar û hem jî di jiyana kar de.

**Ez dikarim karê xwe bi xwe saz bikim li Fînlandiyayê?**

- Karsazkirin yek ji îhtimalan e ku mirovek dahatiya xwe li Fînlandiyayê qezenc bike.
- Hin teşebisên serkeftî yên koçberan hene, wek mînak di qadên xwarinçêkirin, ticaret, mal û milk, avakirin, veguhastin û xizmetên civakî de.
- Beriya ku teşebisekê çêbikin, divê hûn ji qanûnên Fînî, sîstema bacê, hawirdora teşebisê û pêwîstiyên madî agahdar bin.
- Şiyanên zimanê Fînî di çalakiyên teşebisî de esasî ne.
- Hûn dikarin di pardema destpêkê ya çêkirina teşebisekê de destega aborî bistînin eger pîlana we ya kar ji aliyê xizmetên kardariyê ve were pejirandin.

**Li Fînlandiyayê çawa ez dikarim ji bo pîşeyekê bixwînim?**

- Eger dereceyeke we hebe, hûn dikarin pê bizanin ka çawa ew dikare ji bo dereceyeke wekhev a Fînî bê raguhestin. Li Fînlandiyayê di piraniya rewşan de ji we tê xwestin ku hûn xwendinên sereke pêk bînin.
- Gelek zêde hejmarên enstîtuyên pîşeyî li Fînlandiyayê bijartinên fireh ji bo perwerdehiya pîşeyî û bernameyên hîndariyê pêşkêş dikin, ku kêrdariyan ji bo gelek pîşeyên pratîkî didin.
- Xwendin piranî du sê salan dikişînin.
- Enstîtuyên pîşeyî xebatên zêdeyî yên zimanan dabîn dikin û alîkariya wan kesan dikin ku zimanê wan ê dayîkê Fînî an jî Swêdî nîne.
- Her wisa gelek hejmarên enstîtuyên perwerdehiya bilind jî heye, wek zanîngehên zanistên pêkhînerî û zanîngehan.
- Li Fînlandiyayê, perwerdehiya bilind tev bêpere ye.

**Li Fînlandiyayê jin kîjan cure karan dikarin bikin?**

- Li Fînlandiyayê bi timamî tiştekî edetî ye ku mêr û jin di heman cure karan de bixebitin.
- Wek mînak, mêr dikarin bibin mamosteyên kreşê an jî hemşîre û gelek jin jî karê bi dest an jî ajokariya otobêsan dikin.
- Ji hemû jinan tê hêvîkirin ku ji bo pîşeyekê bixwînin û bikevin nav jiyana kar.

- Sîstema kreşê ji bo jinan pêkan dike ku bi timamî kar bikin eger çend zarokên wan ên biçûk hebin jî.

**Eger dayîka malê jî bixebite, kî li malê xudan dike?**

- Li Fînlandiyayê berpirsiyariyên dêûbavtiyê û peywîrên malê bi wekhevî navbera mêr û jinan tê parvekirin.
- Her du dêûbav beşdarî xwarinçêkirinê, paqijkirinê û zarokxudankirinê dibin.
- Dema ku herkesê li malbatê biçe dibistanê û beşdarî jiyana kar bibe, karên malê jî divê bi wekhevî navbera endamên malbatê bên parvekirin.
- Di dibistanên seretayî yên Fînî de, hem kurik û hem jî keçik tên hînkirin bê ka çawa xwarinê amade bikin, malê paqij bikin û mala xwe baş xweyî derkevin.

## Vîdeo 6: Sîgorteya civakî û xizmetên tenduristiyê li Fînlandiyayê

**Ev vîdeo derbarê kotaya penaberan e ku li Fînlandiyayê ji nû ve bi cih dibin**

**Sîgorteya civakî li Fînlandiyayê çawa tê rêvebirin?**

- Eger hûn li ser xwe bin û jêr 65 salî bin, ji we tê hêvîkirin ku hûn tam demî bixebitin û bi dahatiya xwe ya ji kar hem xwe û hem jî malbata xwe xudan bikin.
- Herkes bacê ji dahatiya xwe dide da ku heqê xizmetên giştî bide.
- Bac ji alîkariyên civakî yên pereyî jî tê standin.
- Fînlandiya welatekî xwedî refah e ku wateya wê ew e ku eger mirovek bê kar be, nexweş be, seqet an jî pîr be, dewlet pêwîstiyên wî/wê yên sereke didê.
- Hemû xizmetên sîgorteya civakî bi bacan tên fonkirin.

**Ez xwedî heqê sîgorteya civakî me li Fînlandiyayê?**

- Wek niştecîyekî şaredariyê hûn xwedî maf in li Fînlandiyayê eger pêwîstiyeke we hebe. Ev xizmetên cuda yên civakî û sûdeweriyên civakî yên di rewşên cihê yên jiyanê de digire nav xwe.
- Saziya Sigorteya Civakî ya Fînlandiyayê, Kela, ji bo hemû niştecîyên şaredariyan xizmetê dabîn dike têkildarî mijarên sîgorteya civakî.

**Sîstema sîgorteya civakî ji bo mirovên pîr û seqetan xudankirinê dabîn dike?**

- Şaredarî xwedî berpirsiyariya sereke ne ji bo xudankirina mirovên pîr û seqetan.
- Şaredarî dikarin pêwîstiyên maldarkirinê yên taybet ên wek xwe gihandina bi erebeya biteker dabîn bikin.
- Xizmetên rehabîlîtasyona takekesî ya ji bo mirovên pîr û seqetan qismek li şaredariyan û qismek jî li nexweşxaneyên mezin hene.
- Dêûbavên ku zarokên wan ên bi giranî seqet hene dikarin destega aborî ya zêdehî bistînin ji bo xercaneyên têkildarî zarokê bikarin pêk bînin.
- Zarokên seqet diçin dibistanê û alîkariyên taybet ji mamosteyên xwe distînin.

**Li Fînlandiyayê sûdeweriyên malbatî yên çawa ji dêûbavan re tê dayîn?**

- Hûn xwedî maf in ku xizmetên dayîktiyê bi kar bînin heyama avisbûnê û piştî zarokanînê.
- Klînîkên dayîktiyê tenduristiya we û tenduristiya bebikê raçav dike.

- Gelek jin di nexweşxaneyên bi kalîteyên bilind de zarokê tînin dinyayê.
- Piştî bûyîna zarokê, hûn dikarin li malê zarokê xudan bikin.
- Di vê heyamê de, destega aborî ji bo dêûbavên ku zarokê xudan dikin heye, ku ew dibe dayîk bi an jî bav be.
- Li Fînlandiyayê, hindî ku diçe populer dibe ku bav li mal bimînin û zarokê xudan bikin her ku dayîk diçe ser kar.

**Mafê min heye ku ez li Fînlandiyayê xizmetên tenduristiyê bi kar bînim?**

- Hûn wek welatiyên Fînlandiyayê xwedî heman mafên wekhev in.
- Muayeneya tenduristiyê ji bo hemû penaberên kotayê û malbatên wan tê organîzekirin dema ew digihîjin şaredariya xwe ya nû. Ev yek ê bihêle ku xebatkarê tenduristiyê biryarê bide bê ka mirovek pêwîstî bi xudankirina tenduristiyê heye.
- Girîng e ku hûn reçeteyên xwe û belgeyên xwe yên tibî bi xwe re bînin dema hûn seyahatê dikin.
- Li Fînlandiyayê, hemû pisporên tenduristiyê û wergêr bi veşartîhiştina pîşeyî girêdayî qanûnê ne.

**Ezê kîjan cure xizmetên tenduristiyê wergirim?**

- Wek niştecîyê şaredariyê hûnê bi sîstema tenduristiyê ya giştî bên parastin.
- Xizmetên tenduristiya giştî xudankirina esasî ya tenduristiyê û tedawiya tibî dabîn dikin, lê di organîzekirina wan xizmetan de li hin şaredariyan cudatî hene.
- Xudankirina tenduristiya zarokan ji dema jidayîkbûnê ta qedandina wan a dibistana sereke berdewam dike.
- Pêwîstiya we ya bi her cure xudankirina tenduristiyê û xizmetên tenduristiyê dê bê nirxandin û eger pêwîst bike hûnê ji bo xizmeta guncav bên arastekirin.
- Eger hûn rastî êşkence û tundiyê hatibin, dibe hûn destega psîkolojîk û yên din wergirin da ku ji wê tecribeya trawmayê xilas bin. Ew xizmet ji bo kesên bi her temenê peyde dibin.

**Çi diqewime eger dema li ser kar ez nexweş bikevim?**

- Herkesê ku wek mayinde li Fînlandiya niştecî bûye bi sîgorteya tenduristiyê ya netewî tê parastin, ku bi tevkariyên xwedî sîgorte û karsazan ve tê fînansekirin.
- Eger hûn nexweş bikevin an jî qezayê derbas bikin, mafê we heye ku li malê bimînin, lê divê hûn belgeya ji bijîşk standî bidin karsazê xwe.

**Mirov têkildarî pirsgirêkên xwe yên cinsî jî xizmetên tenduristiyê werdigirin?**

- Navendên tenduristiyê û klînîkên wan ên bergiriya avisbûnê derbarê pirsgirêkên cinsî û bergiriya avisbûnê xizmetên bê-pere didin.
- Nexweşiyên ku bi rêya têkildariyên cinsî derbas dibin li navendên tenduristiyê an jî li klînîkên taybet tên tedawîkirin. Navendên tenduristiyê testên HIVê pêk tînin û li Fînlandiyayê dermandayîna ji bo nexweşên HIVê bê pere ye.

**Xizmetên giştî yên tenduristiyê tedawiya diranan digire nav xwe?**

- Wek niştecîyekê şaredariyê mafê we heye ku hûn tedawiya diranan a giştî bi kar bînin.
- Hemû penaberên kotayê dê check-upeke derbas bikin û pêşniyaran hilgirin da ku derbarê xwarinê û paqijiyê de çawa li didanên xwe xwedî derkevin.

- Gava ku diranên we pêwîstî bi tedawiyê an jî emeliyatê bibînin, hûnê ji bo wan xizmetan hevdîtinê wergirin.

**Ez dikarim reçeteyên xwe yên berê yên ji welatê xwe anî li Fînlandiyayê bi kar bînim?**

- Li Fînlandiyayê, bijîşk dermanan dinivîsin ji bo nexweşiyan. Hûnê reçeteya bijîşk wergirin ku divê hûn wê bibin dermanxaneyê da ku dermanên xwe bikirin.
- Eger nexweşiyên we yên dem-dirêj hebin, reçeteyên xwe yên berê bi xwe re bibin hevdîtina bijîşk li Fînlandiyayê.

Hûn gelek bixêr hatin ji bo destpêkirina jiyana xwe ya nû ya li Fînlandiyayê! TERVETULOA! (BIXÊR HATIN!)